

MAL LI KÛ YE? DI RABÊJA ROMANA KURDÎ YA LI SWÊDÊ DE, JI NÛ VE NIRXANDINA “KURDISTAN” Û “DIYASPORA”YÊ

1. Destpêk

Wekî ku tê qebûlkirin kurd ne tenê ji aliyê erdnîgariyê ve lêbelê ji aliyê siyasî, zimanî û bîrdoziyê ve jî hatine dabeşkirin (Aknur 2012; Natali 2005; Rudolph 2003). Li hember kurdan, polîtîkayên dewletan li gorî hikûmetên desthilatdar ji hevdu cihê bûne. Piştî Şerê Kendavê yê 1991î, kêşeya kurd li Sûriyeyê, Tirkîyeyê, Îran û Iraqê ku her yek ji wan beşeke Kurdistanê di nav xwe de dihewîne, li herêma Rojhilata Navîn û di siyaseta navneteweyî de bû babetekî zaf muhîm. Bi vî awayî, mijarên li ser neteweperweriya kurdan û kêşeyên polîtîk, meseleyên çand û ziman, wêje jî di nav de, zêdetir bal kişandin li ser xwe. Lêbelê, dema ku mirov xebatên li ser wêjeya kurdî dide ber xebatên li ser mijarên polîtîk û dîrokî, mirov dibîne ku xebatên wêjeyî kêma in, lêkolînên (piraniya wan li Ewropa û DYAYê hatine kirin) li ser hemû herêmên kurdî, bi herdu zaravayên sereke soranî û kurmançî, bi awayekî berbiçav van salên dawî zêde bûn. Cihêrengiya zimanî û kêmasiya yekîtiya siyasî û neteweyî, ne tenê karakterekî perçebûyî yê rabêja romana kurdî pêk anî, lêbelê di heman demê de ji bo lêgerîna azadiyê li welatên rojava, bêcihûwarbûna bi darê zorê û koçberiya dilxwazî pêk anî. Her çiqas çend rewşenbîrên kurd ji ber nakokiyên siyasî penaberiya li welatên rojava hilibijartibin û li wir derfeta weşandina romanên bi zaravayê soranî û kurmançî bi dest

xistibin jî, yên mayîn, digel nakokiyên siyasî, welatê xwe neterikandin; dîsa jî, kesên ku li welêt man ji bo nivîsê carna bi mecbûrî an jî bi dilxwazî zimanê fermî yê dewletan ên wekî erebî, farisî û tirkî hilbijartin.

Her çiqasî rabêja romana kurdî di salên 1980yî de li Swêdê werar kiribe jî, ji wê çaxê û vir ve bi dehan roman hatine hilberandin, piraniya van romanana bala xwe nedan Swêdê, welatê ku lê rûdinin, lê berevajî vê, bala xwe dane li ser “welat”ê xwe yê xwemalî, Kurdistanê. Bi gotineke din, romannûsên li Swêdê rabêjek afirandin ku tê de berê pêşîn giringî didane Kurdistanê. Ev gotar li ser sê romanên kurdî hûr dibe, *Pêlên Bêrîkirinê* (1997) ya Mustafa Aydogan, *Ronakbîr* (2003) a Laleş Qaso û *Payîza Dereng* (2005) a Fîrat Cewerî ku temamiya wan li ser Swêd û Kurdistanê ne, ew bi têkildarî avakirina “welêt” in ku ji aliyê serboriyên sirgûniyê ve têne hilberandin.

2. Ramanên Metodolojîk

Di vê gotarê de, “romana kurdî” berhemeke kurdî ye ku bi zaravayekî zimanê kurdî ve hatiye nivîsîn. Ev derbirrîn, di heman demê de bi nîqaşên li ser nasnameya neteweyî ya kurdî re têkildar e ku tê de zimanê kurdî wekî diyarkerê nasnameya kurdî tê hesibandin (Kreyenbroek & Allison 1996: 1; McDowall 2004: 9; Vali 2003: 100). Ya herî giring jî, romannûsên ku li vir tînin nixandî jî di heman demê de him di rabêjên romanî de him jî di weşanên xwe yê din de ji bo kurdan giringiya kurdî destnîşan dikin û herwiha kurdan bo xwendin û nivîsandina bi kurdî teşwîq dikin.

Ez ê tenê li ser berhemên romannûsên ji bakurê Kurdistanê bihizirim. Sedema ku ez xwe bi herêmekî re bi sînor dikim serê berîn de ev e; nasname û fikra “welêt” li gorî cihêrengiya pêwendî û polîtîk, di her netew-dewletekî de bi awayekî cuda werar dike (Natali 2005; Romano 2006). Rewşa kurdên ji Kurdîstana Iraq û Îranê ji rewşa kurdên Tirkiyeyê cudatir e, di van dewletan de, kurd xwediyê pêwendiyên cuda yê sosyopolîtîk û çandî ne. Di bindestiya netewên cuda de, kurd bi polîtîkayên cuda re rû bi rû dimînin, ev jî afirandina rabêjên wêjeyî yê cuda encam dide ku nav xwe de tema, mijar û “welat”ên cuda dihewînin. Ev nêzîkahî pêdivî pê nake ku mirov kêmasiya wêjeya kurdî ya hevpar pêşbînî bike; pirtir, hewl dide ku di nava heman zaravayê de, têkildariya bi heman derdora polîtîk, civakî û îdeolojîk ve xwe bigihîne analîzeke berawirdî ya deqên wêjeyî. Ji vê jî zêdetir, dema ku romanên ji herêmên cuda jî lê zêde bibin, wê demê hewcedariya lêkolînên li ser herêmên cuda yê

kurdan û diyasporaya wan jî peyda dibe ku ev jî bi fikra min ne guncav e bo analîzeke wêjeyî ya ku xwe dispêre nêzîkahiyên metodolojîk ên têvel. Romanên ji herêmen din, ên li Ermenîstana Sovyetê jî tê de, bi zaravayên cuda ve (zazakî, kurmancî, soranî) û bi rênivîsên cuda ve (erebî û krîlî) hatine nivîsîn.

Ji ber ku armanca min geşedana têgihîştineke kûrbîn a formasyon û giringiya “welêt” e, wekî ku ji bo vê analîzê jî guncan e, ez dixwazim nêzîkahiya xwe ya metodolojîk cihêreng bikim. Lewma, ji xêncî lêhûrbûna li ser teşe û naveroka romanên, ku ji bo deqê navxweyî ye, ev gotar nivîskarî û pêwendîya sosyo-polîtîk wekî alavekî bi kar tîne da ku fehmeke çêtir a deqê derîne. Ji ber vê hindê, ev gotara di nava ramanên metodolojîk de radiweste, bi rêya xemxwariya wateyên romanên ên sembolîk, siyasî û civakî, hewl dide ku wateya nitirandinên deqî bi fehmeke civakî û siyasî ve ronî bike ku dorhêla wan rapêçaye. Ya herî giring jî, ev gotar di metoda xwe ya li ser wêjeyê de erdnîgariya însanî bi kar tîne, nîqaş dike ku wêje û bi taybetî jî roman di civakekê an jî di neteweyekê de, alava lêkolînên erdnîgariyê pêk tîne (Bordessa 1988; Pocock 1981; Porteous 1985). Lewma divê mirov pêwendîdarkirina (*contextualisation*) roman/romannûs bide li ber çavan, da ku bikaribe pirsê netewe/civak çawa an jî çima tê sazîkirin, bibersivîne. Di vê wateyê de, min ji metodên peywendî û deqî sîd wergirt.

Bi ser de jî, ez têkoşiyam ku di nav analîzên tematîk re, mijarên bi têgihên ku ji berê ve hatine dabêşkirin re têkildar in -bi taybetî jî “nasname”, “welat” û “diyaspora”-, pênase bikim da ku bikaribim wêneyekî berfireh ê romanên bînim pê. Analîzên tematîk rê li ber lêkolîner xweş dike ku di navbera her deqê de têkiliyekê biafirîne û hevşibî û cudahiyan, berawirdî hevdu bike. Hingê, wiha dikare bê fikirîn ku analîzên pêwendî, deqî, tematîk wê li dij hev rabin, lê bi rastî, berevajî vê rasttir e û metoda navborî dixwaze nêzîkahiyê berfireh û rihet ji xwendina rabêja romanî re pêşkêş bike ya ku destûrê dide hemû faktorên ku tevkarîya wateyê dikin.

3. Ramanên Teorîk

Têkiliya digel hevdu ya hin dîsîplînên kifş, ji aliyê hin rexnegirên wêjeyî û rewşenbîran ve baleke pir kêrmeşandî ye ser xwe. Ev têkiliya di navbera erdnîgarî û wêjeyê de, bi awayekî sereke ji aliyê erdnîgarzanan ve hatiye nîqaşkirin ku wêjeya aşopî ji deqên xwe re wekî nirxekî alternatîf didîtin, çawa ku Meinin (1983: 316) jî amaje pê dike ew “embareke

giranbiha ya nitirandinên zelal ên dîmen û jiyane” ye. Lêbelê, hin erdnîgarzan (Claval 1998; Crang 1998; Shurmer-Smith 2002) ji perspektîva erdnîgariyê ve li wêjeyê dinêrin û dibêjin ku “senteza rast a erdnîgarî û wêjeyê wê ji wateyê re bi temamî metodeke nû hilberîne” (Bordessa 1988: 273). Ez ligel vê fikrê me û ji ber vê yekê, analîza min a di vê gotarê de ji teoriya çandî û wêjeyî derdikeve ya ku îdia dike “wêje [...] *ne tenê* berhemêke mexsûsê takekesiya (*idiosyncratic*) nivîskêr e, lê çawa ku cih û waran çêdike û ji nû ve hildiberîne, pratîkên civakî û çandî him diyar dike him jî vedişêre” (Gilbert û Simpson-Housley 1997:237).

Ev gotar nîqaş dike ku şewaza fehma nivîskêr a li ser cih û waran û ji ber hindê jî, miameleya wî/wê ya li ser cih û waran ji layê çandî, civakî û siyasî ve bi şert û şîrûdan ve girêdayî ye û ev yeka îdeoloji û çanda ku ew pê ve vebestî ye, nîşan dide. Di vê rewşê de, têkiliya di navbera erdnîgarî û wêjeyê de, bi riya ku roman tê de wekî teswîra “cih” an jî “warekî” taybet tê ravekirin; ji hêla pêwendiya çandî ya fikrê mirovan û nêrînên cihekî taybet ve, ew dikare navbînan (*insights*) pêşkêşî hundirê xwezaya têkiliya mekanî ya wan bike.

Roman demeke dirêj weke serpêhatiyêke zindî hate hizirîn ku rê li ber xwînerên xwe xweş dike da ku bi rewşên taybet re wekhevîyê pêk bîne (*identify with*) û cesaretê bide wan ji bo ku mîna karakteran hîs bikin û tevbigerin. Roman weke cûreyekî tete pênasekirin, ji ber vê hindê, bi riya derxistina wateyekê ji jiyana tatekesan, têdikoşe rastiye biafirîne (Lukács 1971; McKeon 2000; Watt 2001 [1957]). Lêbelê, rastiya di hundirê romanê de, nayê qebûl kirin ku bi hêsani wekî serpêhatiyên takekesî yên romannûsan bê nîşandan, ji ber ku civak, mekan û derdora civakî ya romanê dibe ku bo îdeolojiyên têvel, mijar û baweriyên bê bikaranîn, a rasttir ne ji bo pêşkêşkirina nirxekî “objektîv” yê rastiyeke sêbjektîv a bêtêwendî ye.

Bi gelemperî tê fikirîn, di wêjeyê de cureya (*genre*) romanê teşeyêke ku bi giranî xwe dispêre mîmesîsê (bi riya teknîkên realist teqlîda rastiye) û rastiya ku dibêje “roman bi behremendiya nivîskaran ve girêdayî ye ku pê dikarin xwîneran bidin bawer kirin a ku ew lê şahidiyê dikin rastî ye, ne ku huner e” (Davis 1987 205). Bi zanebûn an jî carna ji nezaniyê cihewaziyên çandî û siyasî yên “rast” ên di navbera neteweyan de nîşan didin, çimkî ew jî pêvajoya avakirina cihêrengiyên neteweyî, çandî û siyasî de hêmanek in. Bi gotineke din, çîrokên di romanên de ji serpêhatiyên jiyayî cudatir nînin û babetên wan jî bi piranî dibe ku ber bi cihêrengiyên neteweyî û çandî ve hatibine arastekirin.

4. Rabêja romana kurdî li derveyî sînorên Kurdistanê

Divê bê bibîrxistin ku rabêja romana kurdî xwedî birrek ronakbîr û nivîskarên kurd ên ji Yekitiya Sovyetê ya Kevn (YSK) e ku kedeke mezin dane geşedana zaravayê kurdiya kurmançî û bi vî awayî jî derketina romana kurdî. Heger em bi kurtasî qala rewşa ronakbîrên di dema YSKê û bandora wan a li ser wêje û weşanên kurdî bikin, wê bikêrhatî be.

Li dema salên 1920an, kurdan roleke giring di pêşxistina perwerdehiya kurdî û çalakiyên wêjeyî de listin (Leezenberg 2011: 89). Kurdên Sovyeta Kevn piştî şoreşa 1917an, formeke nivîskî ya zimanê xwe yê zikmakî bi dest ve anîn û cara berîn di salên 1920an de bi bikaranîna alfabeya ermenî ve dest bi nivîsê kirin. Di sala 1927an de bi diristkirinên ji aliyê Îsahak Marogûlov û Erebe Şemo ve ber bi alfabeya latînî ve guherîn heta ku di sala 1945an de alfabeya kirilî li wan hate ferzkirin. Nika kurdên YSKê him rênivîsa krilî him jî ya latînî dixebitînin. Pirtûka ewil a bi kurdî ya dibistanê hat weşandin û di Sovyeta Ermenîstanê de, ber bi pexşana modern gavên bingehîn hatine avêtin (Leezenberg 2011: 89), wê demê yekemîn romana kurdî *Şivanê Kurmanca* ya Erebe Şemo (1898-1978) ya ku xwe dispêre jiyana nivîskêr, li Erîvanê di sala 1935an de hate weşandin. *Xatê Xanim* (1959), *Dê* (1975) û *Gundê Mêrxasan* (1968) yên Eliyê Evdîrehman, *Hewarîya* (1967) Heciyê Cindî û *Kurdên Rêwî* (1981) ya Sehîdê Îbo li YSKê, di listeya ewil a romanên kurdî yên weşiyayî de cih digirin.

Giring e ku mirov bibêje wêjeya kurdî bi taybetî di cureya romanê de li Ewropayê di derdora salên 1980yî de pêş ve çû, berê pêşîn jî li Swêdê. Swêda ku ji aliyê Khayati (2008) ve wekî “navenda hilkêşanê” tê rabeberkirin, ji bo kurdan, welatekî giring ê mazûvaniyê ye ku piraniya wan ji Iraq û Îranê ne û beşeke wan a mezin jî ronakbîr in ku ji hêla siyasî ve çalak in (Schmidinger 2010). Van Bruinessen (1999) îdia dike ku ronakbîr, bi taybetî nivîskar û rojnameger, Swêdê ji xwe re wekî welatê sirgûniyê hildibijêrin. Bi rastî, bi piştevaniya aborî ya ji Desteya Neteweyî ya Karûbarên Çandî (*Statens Çandråd*) û Dezgeha Çandî ya Dahatûyê (*Stiftelsen Framtidens Çand*), ronakbîran weşan bi rê ve birin û pirtûkxaneyêke kurdî vekirin (Alinia 2004: 34). Bêguman, têkoşîna ronakbîr û nivîskarên ji bakurê Kurdistanê yên li Swêdê piştgiriya ziman û wêjeya kurdî kir û fêdeya wê ji rabêja romanî re çêbû û Mehmed Uzun (1953-2006) û Mahmut Baksî (1944-2000) ku bi salan li Swêdê sirgûnman, dikarin wekî romannûsên herî berhemdar ên ji bakurê Kurdistanê bîn hesabandin.

Wekî ku di teza min a doktorayê de hatiye avakirin, ku mijara wê romanên ji bakurê Kurdistanê û diyasporaya salên di navbera 1984 û 2010an de ye, ji 68 romanên 47 hebên wan ji aliyê nivîskarên bakurê Kurdistanê yên ku li Swêdê dijîn ve hatiye nivîsîn. Piraniya romanên li Kurdistanê diqewimin û pir hindikên wan jî diyasporayê bi cih digirin an jî li wir dest pê dikin. Min di lêkolîna xwe ya doktorayê de hemû romanên ku heta sala 2010an li Swêdê çapbûyî vekolandin, min di wê xebatê de destnîşan kir ku romanên sirgûniyê yên li Swêdê bi gelemperî bala xwe nadin li ser tu serpêhatiyên kartêker û erênî yên ku ew li sirgûniyê rû bi rû mane. Bi kurtî, di piraniya van romanên de çîrok li herêmeke Kurdistanê diqewime û pir hindikên wan jî balê dikişînine ser serpêhatiyên koçberî û sirgûniyê li Ewropayê. Sermeselê, di rêzeromana Mezher Bozan *Av Zelal Bû I, II, III û IV* (2002, 2004, 2006, 2008) de vebêjer xêncî dema ku pesnê sîstema demokratîk û standartên bilind ên jiyandê dide, pir hindik qala Swêdê dike. Di romana avaker (*bildungsroman*) a bi navê *Asim* (2007) a Mezher Bozan de, ne gengaz e ku mirov tiştêkî bi sirgûniyê re têkildar e bi dest bixe; her tişt bi serpêhatiyên berê yên li welêt ve girêdayî ye. Herwiha, romana *Piştî Bîst Salan* (2007) a Silêman Demîr, *Çirîskên Rizgariyê* (1995) ya Mihemed Dehsîwar, *Mirina Kalekî Rind* (1987) û *Siya Evînê* (1987) yên Mehmed Uzun giş bi awayekî serveyî behsa jiyana li sirgûniyê dikin. Lehengên sereke yên van romanên ku li sirgûniyê xuya dibin, vedigerine welatê xwe, hinek jî wan hewl didin ku ji nû ve adapteyî welatê xwe bibin, ew welatê ku bi salan jê dûr ketine, hinek jî li riyên dîtir digerin da ku welatê xwe ji destên yên din derînin. Lêbelê, çawa ku me berê jî bal kişandê, serpêhatiyên sirgûnî an jî mijarên bi welatê mazûvan ve têkildar, ne xema sereke ya romannûsan e, xêncî sê romanên ku li Swêdê diqewimin û di heman demê de jî di vê gotarê de têne nirxandin; *Pêlên Bêrikirinê*, *Ronakbîr* û *Payîza Dereng*. Ev gotara wê di her sê romanên navborî de, di nav hewldana vedîtina serpêhatiyên bêcîhûwarkirinê de be, da ku têkiliya bîra diyasporayê ligel rabirdûya takekesî û komelî ronî bike û salixê xeyala “welêt” bide. Bi vê kirina xwe ve, bi taybetî du beşên balê bikişînin li ser xwe. Beşa yekem wê di romanên de serpêhatiyên sirgûniyê lêbikole û wê bipirse ka gelo welatê mazûvan wekî “mal”ê tê fikirin an na, çimkî cihê ku mirov lê dihêwire nayê wateya mala rastîn a kesekî. Beşa duyem wê bi bergehêkî rexneyî li şayesandîna Kurdistanê binêre.

5. Serpêhatiyên bêcihûwarbûnê: Diyaspora wekî “cihekî demkî”

Piştî ku me kêmasiya wê nirxand û şayesandinên wê yên neyînî destnîşan kir, diyasporaya rabêja romanî, ji bo ku mirov wateya welatê xwemalî fêhm bike, giring e. Ji ber vê hindê, ev beşa pirs dixe bê ka welatê mirov lê dihêwire wekî malê tê fikirin an na. Eger welatê ku mirov lê dihêwire nebe, wê demê “mal” di van romanên sirgûnî de li ku ye? Ev yeka pirseke din derdixe holê, -eger ew der ne “mal” be, wê demê welatê ku ew lê dihêwirin ji bo wan tê çi wateyê? Ji bo romannûsên ku li sirgûniyê dijîn, bi bersivên van pirsan ve ne tenê îfadekirina wateya welatê mazûvan encam dide, lê herwiha bi tevkeriyê ve avakirinên “mal”ê yên vebêjê derdixe holê. Di vê lêkolînê de, mijara malê ji fikrekî zêdetir wekî rewşeke fîzîkî tê xuya kirin, ev jî cihekî daîmî yê bicihwarbûnê tîne zimên ku tê de mirov xwe ewle, rehet û aşna hîs dixe. Ji hêleke din ve, welat hesteker mekanî ye ku cihê xwemalî yê ku mirov pê ve bi hestiyarî û fîzîkî girêdayî ye, îşaret dixe. Ji ber ku ev deqa serî li bêjeyên “mal” û “welat” dide, wê demê kilîdbêjeya “welêt” wê bê bikaranîn.

Xencî ku meriv behsa rewşa kurdan a bêdewletbûna derasayî bike “welat” babeteke pir-rehendî û pir-tebeqeyî ye. Lêbelê, di rewşa koçberî û veqetînê de, hizra “welêt” wateyên tevlihevtir ên ku hesta demkîbûnê zindî dixe, dihundirîne. “Welat” û “sirgûn” du têgeh in ku bi sedsalan bi hev re hatine xebitandin, wekî ku nifûsa li sirgûniyê bi kûrahî di bin bandorê de dimîne, bi welatê xwe re bi awayekî îdeolojîk û çandî tê girêdan. Wekî ku Avtar Brah (1996:190) jî îdia dixe, “têgiha diyasporayê binhişê malê ye”. Di welatên cihnişîn de, ev civak û komên ku bi darê zorê nehatine koçberkirin, nasnameyêke bêberdewam ji nû ve diafirînin û bi endamên din ên li welatê xeyalî re bi awayekî berdewam di nav têkiliyê de ne (Marienstrass 1989; Safran 1991).

Li gorî tiştên navborî, “welat” roleke diyarker di meylîdariya koçberên kurd de dilîze (Alinia 2004; Eliassi 2010, 2012; Khayati 2008; Walhbeck 1999). Wekî ku Ahmedzade (2011, 65) amaje pê dixe “ji ber ku romana kurdî bê şek û şibhe ji aliyê netew-dewletê ve nehatiye afirandin, kesek bi rehetî dikare şopa xeyala netew-dewletê di romana kurdî de bibîne”. Ji ber vê hindê, rabêja romanî ya kurdî di heman demê de, derbareyê avakirina welatê qetiyayî li derveyî welêt fikra giştî ya kurdên mişext nîşan dide. Lêbelê, roman li hember welêt û welatê mazûvan xwedî bergehekî rexneyî ye, wekî ku wê paşê jî bê dîtîn, an bi riya nebûna baldariyê an jî bi riya wêneyê neyînî yê dewletên ewropî, wê derê ji maleke nû zêdetir mîna “cihekî demkî” dibînin.

Bo bidestpêkirinê, tevlêbûna çanda welatê mazûvan, ji bo berdewamiya jiyana wekî vebijarkekî nayê dîtin. Di *Pêlên Bêrîkirinê* de serlehengê (*protogonist*)ê navnediyar ê ku rojêke sirgûniyê ya li kolanên Stockholmê şayes dike, bi teknîkek nav-aşopî (*intra-fictional*) ya vebêjê bi kar tîne ku tê de vebêjer ji nişkê ve dikeve nav çîrokê, xwîner dawetî jiyana xwe ya ku ji hêla enstîtu/rêxistinên kurdî û koçberên kurd ên weke xwe ve hatiye rapêçandin, dike. Bi vebêjeke zêde dîdaktîk ve, kurdên li wir didin xuyakirin ku ew ne di nav hewldana afirandina jîngehekê ne ku ji “welat”ê wan ê dûrmayî cudatir e, çimkî ew dikin ku heyîna xwe ya li sirgûniyê wekî maweyek demkî û kurt bipejirînin. Lêbelê ferqa vê yekê de ne ku ev mawe texmîna wan zêdetir dirêj kir û ji ber vê sedemê hewl didin ku hawirdoreke cihê re rû bi rû nemînin an jî, li sirgûniyê, xêncî çalakiyên demkî yên sosyo-polîtîk ku seba xatirê “welat”ê wan e, beşdarî tu xebatan nabin. Serlehengê (*protagonist*) *Pêlên Bêrîkirinê* bi awayekî rasterast têkiliya serleheng a digel sirgûniyê wiha salix dide “Jiyana sirgûniyê dest û lingên wî girêdabûn” (r. 126), ev jî neçariya piraniya salên li sirgûniyê û negengaziya vegeerê radigre, di rastiya xwe de, bi gotineke din, ew “hêmaneke giring a rewşa sirgûniyê ye” (Torres 1999: 37) û “dibe daxwazeke efsaneyî” (Naficy 1993).

Lewma ji ber hîsên xurt ên derbarê vegeerê, rewşa sirgûnî ya li devera cihûwarbûnê ji aliyê hesta neaîdiyet û îzolasyonê ve hatiye pênasekirin. *Pêlên Bêrîkirinê* nîşanî mirov dide ku koçberên kurd ne li vegeerê welatê xwe de bi ser ketine ne jî hewtiya xwe bi jiyana nû ya ji aliyê welatê mazûvan ve li wan hatiye derpêşkirin, tînin. Di vê çarçoveyê de, serleheng fikrên xwe yên derheqê serboriya sirgûniyê de wiha raber dike:

“Dema min dest bi jiyana sirgûnê kir, min weha hêvî dikir ku lavalvka min a li odeya rûniştinê, du caran li dor odeyê bizivirîya, ez ê vegeeriyama welêt. Lê wê dora xwe ya çaran jî tamam kir, hîn ez û ew li warekî nenas li çavên hevdu dinihêrin”(r. 166).

Romana Laleş Qaso *Ronakbîr*, bi vebêja kesê yekem ve, xwe dispêre serboriyên sirgûnî yên serlehengê bi navê Ronakbîr ê ku dibêje penaberekî kurd nikare welatê mazûvan weke welatê dayîka xwe bibîne û her çiqas penaber bi salan li wir bijîn jî, hesta windakirin û tenêtiyê her tim li cihê xwe dimîne. Vebêjer û lehengê sereke yê ku li Stockholmê diji Ronakbîr, bi hevsera xwe re li hev nake, ji ber nikare karekî guncan ji xwe re bibîne, hergav karê xwe diguherîne. Hindek caran, poşmaniya xwe tîne zimên ku welatê xwe ji bo ku were Ewropayê, hiştiye: “Çi diba

bila bûba, divabû min welatê xwe terk nekiriba”(r. 48). Ew wekî kesekî lap xerîb, ne dikare li welatê xwe vegere, ne jî dikare bibe perçeyek ji vê civak û çanda nû. Ji bo wî ev tê wateya riya bişaftinê di nav serdestiya piraniyê de, wekî ku ji pûtêpênedana vebêjer a derbarê çanda Swêdê an jî şayesandina fizîkî ya Stockholmê jî diyar dibe. Ew bi awayekî zelal hesta xurt a xemgîniyê wiha tîne zimên:

“Ez qebûl nakimmm (...) Unîversîtan bixwîne; dinyayê, kayînatê û rezaleta insên nas bike; duwanzdeh salan di nav agirê zindanên tirkan de biqijqijje; bîst salan li hemberî zilmê têkoşîne bide û di dawiyê de jî were bibe nahtorê pîsiyê, ha! (...) Û bi ser de jî li welatekî Ewropayê! Bêyî xwendinê jî mirov dikaribû bûba xwediyê vî gû yî.” (r. 47)

Ew xwe bêkêr dibîne, çimkî ew ne dikare ji bo welatê xwe tişteki bike, ne jî dikare lê vegere, *“Gava ez li vî welatî jî bo milletê xwe nikaribim tişteki baş bikim û li ber qedemgehan rûnim, ez li vî welatî li çî xwe digirim*”(r. 47-48). Hesta windabûn û tenêtiyê ya Ronakbîr ji rûyê têkil-dariya wî ya niv-dilî ya bi penaberên li Stockholmê re danibû ve, zêdetir dibe. Ji aliyekî din ve, kêmasiya bîreweriya neteweyî ya kurdan pesind nake, û hetta ji jina xwe ya ku gerdeniyeke bi resmê Ataturk li xwe dike û muzîka tirkî guhdarî dike, dûr dikeve. Û ya dîtir, atmosfera siyaseta kurdî û ya penaberên kurd li Ewropayê zor dide wî ku ew divêti û fêdeya doza neteweyî bide ber pirs û pirsiyaran ku wî dixê nav gengeşiyê. Ew wiha destnîşan dike: *“Doza wan dozeke jî êgir e! Ên ku bi vê dozê radi-bin, ên ku li hemberî wê disekinîn û ên ku bêdeng jî dimînin dişewitin! Ev dozeke ku herkesî dişewitîne*”(r. 58). Bi kurtayî, ew ne dikare hînî derûdora xwe ya nû bibe, ne jî dikare nirxên xwe yê neteweyî yê ku wî pê bawer dikir ku zindî ne, biparêze. Ew ji hemû beşdariyên xwe yê li çalakiyên polîtîk ên ku bûne sebaba hatina wî ya li Swêdê, poşman dibe. Hemû hêviyên dahatûya xwe winda dike û baweriya xwe bi koçberên kurd ên li Swêdê dorhêla wî ne, nayîne, çimkî bi raya wî, ew wekî sebebê nebûna entegrasyon û adaptasyona wî ya ligel welatê mazûvan dixuyin.

Serleheng ji ber ku binpêkirinên mafê mirovan yê kurdên li Kurdistanê paşguh kirine, welatên wekî Swêdê tawanbar dike, lêbelê şiroveya wî ya li ser polîtîkayên Ewropayê yê li hember kêşeya kurd nîşan dide ku mesafeya ku ketiye navbera welatê mazûvan û kurdên koçber ji ber vê yekê ye ku wan welatan bala xwe nedane li ser kurdan. Di rabêja romanî ya di romana bi navê *Ronakbîr* de, nîşan dide ku lehengên kurd welatên xwe yê mazûvan, li hember têkoşîna xwe ne pêbawer û ne jî destekker dibînin. Ji vê aliyê ve, *Payîza Dereng* a ku ji aliyê Firat Cewerî ve wekî

mektûb-romanê tê teswîrkirin, mîna keke baş e bo şayesandina aliyên neyînî yê welatê mazûvan. Di nav vebêjên paralel de, nivê romanê li welatê mazûvan ango li Swêdê, nivê din jî li welatê serlehengê bi navê Ferda, derbas dibe. Di nameyên ku ji hevalê xwe re dişîne de, Ferda, an bi eşkeryî an jî bi dizîka ve, Swêd û Kurdistanê berawirdî hevdu dike û tîne zimên ku çanda Swêdê li ser takekesiyên ava bûye û ji hemû hestên komelî bê par maye. Her çiqas pesnê hurmeta wan a li hember çand û nasnameyên cihêreng bike jî li Swêdê dorhêla takekesî, hesta wî ya awarebûn û tenêtiyê kûrtir dike. Berî ku ji bo welatê xwe ji Stockholmê veqete, hestên xwe ji kurê xwe re vedibêje û amaje pê dike ku “*mirov nikare zû bi zû têkeve çihana wan, bi wan re bibe heval, hetta bi rêya hevaltî û dostaniya wan êşa xerîbiyê û bêrikirina welêt ji bîr bike*” (r. 29). Ew bi eşkeryî balê dikişîne li ser dudiliya salên xwe yê sirgûniyê li Swêdê: “*Bîst û heşt sal e ku ez bi niyeta vegeerê li vir dijîm. Laşê min li vir, serê min li welêt bû. Nivê min li vir nivê din li welêt bû*” (r. 20). Wekî ku li we jî ‘eyan e, ji ber sedemên têvel ên navxweyî û derveyî, Ferda û lehengên din ên mişext ên di romanên de nikarin bi civaka xwe ya nû re adapte bibin, ew civaka ku dibe sebeb ku ew çavên xwe li welatê terkîrî bigerînin. Bi kinayî, ev hesta bêcihûwarbûyî û neteweyî ya ku bi welêt re dikeve nav têkiliyên çandî-siyasî (Cliffort 1999; Van Bruinessen 1999; Walhbeck 1999) bûye xala herî girîng a wan hemûyan û konsantrebûna li ser welatê dûredest, dike ku warê ew lê rûdinin ji welêt cudatir wan mijûl bike.

Guherîna erdnîgarî û guherînên pey re yê civakî û çandî, têra karakterên kurd nakin da ku bikaribin ji nav pêvajoya “ji nû ve xwedî mal bûn”ê re derbas bibin. Bi vî awayî, ji bo van karakteran koçberî hêmanên xerîbîbûnê di nav xwe de dihindirîne û bi ser de jî, awarebûnê hembêz dike. Di vê rewşê de awarebûn ji wan re dibe take-welat (Chow 1993: 197) ji ber ku ji nû ve xwedî mal bûn ne bi hêsanî çûyîna malê ye, feqet pêvajoyeke xwedî malbûnê ya avaker e ku mirov ji nav re derbas dibe (Zhang 2008: 43), lê ne ji bo van karakteran. Ew cihên xwe yê nû wekî “cihekî demkî” dihesibînin, ne wekî “mal”ekî, digel ku fikra vegera li “welêt” ber bi planeke rasteqîn ve naguhere. Lêbelê, ev di heman demê de, wan di nav hesteke cihêreng de bi cih dike, ku di vir de, hîsa aîdiyetê ya têkiliya xemilandî ya ligel welatê xwemalî qels dibe ku ev jî erka efsaneyê dide hesreta vegeerê.

6. Bîra diyasporayê: Çavlêgerandineke rexneyî li ser Kurdistanê

Di civakên sirgûnî de, wateya “mal”ê bala pir lêkolîner û ronakbîran kişandiye li ser xwe, Levy û Weingrod (2005) û Ryang û Lie (2009) û herwiha xebatên wêjeya sirgûniyê yên Mishra (2007) û Al-Maleh (2009) ji bo van mînak in. Fikra giştî ew e ku serpêhatiyên sirgûnî şeweya ku ferdê sirgûn “mal”a xwe xeyal dike, diguherîne. Bi vî şiklî, Kurdistan xeyalî ya di rabêja romanên de, hêmanên çandî, dîrokî û siyasî jî tev de, ji aliyê pevgihîştineke têvel a qraliyeteke çandî û sosyo-polîtîk ve tê pê; ev dera bêguman warekî perçebûyî yê bi dîrokeke dilsoj û şertên jiyânê yên xerab ve ye. Wekî ku Vali (1998: 82) tîne zimên, “perçebûna Kurdistanê ya piştî Şerê Cihanî yê Yekemîn û pey re jî cihêrengiya şeweyî ya civaka kurd a ku ji aliyê rejîmên polîtîk û aborî ve hatiye birêvebirin, kurd ji yekîtiya polîtîk bê par hiştiye.” Têkilîya romana kurdî ya bi “alegoriya neteweyî” re (Jameson 1988), nîqaş dike ku wekî welatê kurdan, Kurdistan di romanên serboriyên kambax, kêşeyên navxweyî, pergala feodalîteyê ya rûxîner û li hember tekoşîna neteweyî îdeolojiyên ji hev cuda, derdixe holê. Avakirina “cimaetek muxayyel” a yekgirtî ku ji aliyê Anderson (1983) ve hatiye îcadkirin, bo balkişandina li ser têkçûna kurdan a di avakirina dewletê de, tim û tim li ser zar û zimanan e, Herwiha, bi serboriyên erdnîgariyê, siyasî û çandî yên ku wekî hêmanên neyînî bi dubare têne berpêşkirin, li ser aliyên sosyo-polîtîk û dîrokî yên Kurdistanê, rexneyeke hişk dikin. Vebêj vê yekê eşkere dike ku şayesandina warên kurdan, an jî nasnameyên ji aliyê van deran ve hatine rapêçandin, tenê di çavdêriyên serveyî û realîst de hene, xwe dispêrine rastiyan rûxîner an jî pala xwe didine nêrîna neyînî ya li ser Kurdistan û nasnameya kurdî. Saloxên neyînî yên Kurdistanê ji aliyê faktorên navxweyî û derveyî ve teşe digirin. Anegorî romanên, lehengên kurd giringiya tekoşîna neteweyî paşguh dikin û Kurdistan wan jî bi têra xwe polîtîze nebûye. Kurd an desthilatdariya rayedarên tirk qebûl dikin an jî hin lehengên din (piraniya wan serkêşên eşîran û axa ne) ji bo berjewendiyên xwe bi dewletê re dikevîne nav danûstandinan. Gelek leheng ji ber tirkîaxêviya wan a ku qelsiya fikra wan a neteweyî îşaret dike, têne rexnekirin. Bi tevî tunebûna tekoşîneke neteweyî û kêmasiya piştevaniya kurdên din, qebûlkirina hebûna desthilatdariya tirkan, tevkariya hin kurdan a bi rayedarên dewletê re, herwiha paşdemayîna civakî û çandî, dema ku ev giş tîne li ser hevdu wêneyekî pir neyînî yên Kurdistanê pêk tê ku ev jî rexneyên têvel bi xwe re tîne.

Sermeselê, *Payîza Dereng* a ku li Diyarbekirê, cihê ku helwesta kurdên meheli yê asîmîlebûyî re bûye zemîneke daîm a romanê, derbas dibe. Ev hesta sirgûniyê ji holê ranabe dema ku serlehengê romanê Ferda vedigere mala xwe ya xwemalî. Ew li welatê xwe bi hestên cihêreng ên bêcihûwarbûnê re rû bi rû dimîne, çimkî gelê wî asîmîle dibe. Di vê xalê de, giringiya zimanê kurdî wekî pêkhateyeke nasnameyê derketiye li ber çavan, dejenerebûna Kurdistanê bi riya kêmasiya şixulandina zimanê kurdî ve hatiye zimên. Dema ku lehengê romanê di dewsa kurdî de dixwaze bi zimanê tirkî xeber bide, li gorî vebêjer ev asîmîlasyona wan nîşan dide. Ferdayê ku piştî 28 salên sirgûniyê vedigere welatê xwe, Kurdistanê kambax a ku tê de zimanê dayîkê hatiye piştguhkirin, ferq dike. Di nava romanê de, ew di dewsa kurdî de tirkîaxêviya kurdan rexne dike û hetta hin caran li vegera xwe poşman dibe, ji ber ku bi riya çavdêrikirina tevgerên gelê xwe yê asîmîlebûyî, welatê wî ji wî re wekî welatekî xerîb dixuye. Wekî ku Ferda şîrove dike, “*Wek ez venegeriya-bim welatê xwe, lê ez vegeyriyabim welateki xerîb, nav mirovên xerib, çandeke xerîb*” (r. 221).

Bi tevî hêmanên neyînî, lêhûrbûna li ser hêlên kevneparêz, pedersahî, feodal û bi desthilatdariya axayan û kedxwariya gundiyan ve vebêj nîşan dide ku çawa Kurdistan ji aliyê helwestên xayîn û kesên bêexlaq ve hatiye xerabkirin. Weke mînak, di *Ronakbîr* de vebêjer kurdan rexne dike û bi giştî dibêje, “*Kurd miletekî xirabe ye! Miletekî ku bindestî qebûl kiriye. Û miletekî ku bindestiyê qebûl bike jî ji xwe fedî nake*” (r. 57). Mîna vê yekê, *Payîza Dereng*, bi helwesta xwe ya zêde rexneyî û bi hêmanên xwe yê zêde otobiyoğrafîk ve, raber dike ku rastiya Kurdistanê ye dema ku kurdek gerilla ye, lê cînarê li ber deriyê wî jî qoriciyek e ku bi dewletê re hevkarîyê dike.

“*Ev resimekî welêt yê rastîn e, ev resimê dîrokeke dirêj e û sebeb û encama bindestmayîna me ya sedsalan e. Ev dijminatîya me ya hundirîn û herdemî ye (...) Ev kurmekî xerab e û ev kurme ku ji dil û mêjiyê me dixwe*” (r. 14).

Cuntaya leşkerî ya sala 1980yî û rewşa dijwar û xeternak a girtîgeha Diyarbekirê di salên 1980yî de, bi riya serboriyên xerab ên şexsî aliyekî giring ê bîra sirgûniyê dadigire. Di vê babetê de, ew maweya ku tê de piraniya romannûsan welat terikandiye, dibe nêrîna serdest a “welêt”. Kurdistan bi gelemperî rewşên ku romannûs dîtiye ve girêdayî ye, exlebê caran jî bi serboriyên berîn ên ku di derdora salên 1980yî de rû dane. Heman rewşa di *Pêlên Bêrikirinê* ya Mustafa Aydogan de jî heye ya ku

bi riya realîst a rêzîkirin û teswîrê ve, agahiya nav û teknîka metodên cihê yên îşkenceyê dide xwînerên xwe. Eynî weke Aydoganê ku ji sala 1985an û vir ve li Swêdê dijî, serleheng serboriyên xwe yên girtîgehê bi bîr tîne û bîranînên îşkenceyê dubare dike û ditirse ku ev yeka bandorê li ser jiyana wî ya li welatê nû bike. Ev ji ber demên borî li ber xwe dikeve û di binhişê xwe de ditirse ku polîsên swêdî yên ku dema pêrgî yekî ji wan tê, her tim hewl dide jê dûr bikeve, balê dikişîne li ser vê rastiyê, “*Wê gavê hîn tesîra girtin û lêdanên li girtîgehê ji ser xwe neavêtibû*” (r. 16).

Di bin ronahiya analîzên li jorê de, wekî piraniya ronakbîr û lêkolîneran jî tînin zimên, mirov dikare bibêje, romana kurdî wateyên ku civakên sirgûnî li ser welêt bar kiriye, hildiweşîne. Bi awayekî giştî, ji rûyê dûrbûna ji malê ya cografîk, bi bêrîkirineke îdeal ve têne vebestî, diyaspora gelek caran malê wekî “cihekî efsaneyî” dinitirîne (Anderson, 1983; Bkunt, 2003; Golan, 2002; Veronis, 2007). Tê îdiakirin ku komên sirgûnan ên ku berê wan ber bi welatê wan e, welatê xwe bi awayekî wisa di hundirê rabêjeke mîtolojîk, îdeal û mêjûyî de bi cih dikin ku welatê wan dibê “cihekî ku di rastiyê de di çîrokan de bûye” (Berns-McGown 2007-2008: 8). Ya herî giring, fikra “mal” a ku li paş maye bi riya taybetmendiyên di vebêjê de yên xeyalî û efsaneyî ve ji nû ve hatiye îcadkirin, çimkî li gorî Mordorossian, wêjeya mişextî di navbera “li vir” a xerîb û “welat” êkî romantîzekirî de mêjîyekî dualî ava dike (2002: 16). Lewma, meyla nivîskarên sirgûn li ser xeyala reseniya welêt e û têgiha neteweyê ya bi demên xweş e ku Gayatri Gopinath li gorî neteweya Diyasporaya Asyaya Başûr tesdîq dike; ew “li derveyê dîrokê welatekî xeyalî yê di nav kêlîkekî aram de qerîsî ye” (2005: 4) Ji ber dijwarbûna hesta bêcihûwarbûnê, nivîskar xwe hewceyî afirandina cîhaneke xeyalî û honakî dike da ku rastiyên tund ên sirgûniyê ji holê rake.

Dîsa ermenî (Payaslian 2010) û baskî (bnr. Totoricagiüena 2004) yên sirgûn, di rewşa dûrbûna ji malê ya cografîk de, komên sirgûnan ên ji bo vegerê bi bêrîkirineke îdeal ve tînin vebestî, wê wêneyekî romantîzekirî yê “welêt” saz bikin. Bi van pêşbîniyan ve şayanê gotinê ye ku mirov bibêje wêjeya sirgûniyê angaştên li ser teşeyên “welatê xeyalî” yê sirgûnan xerab dike. Analîza romanên kurdî yên sirgûnî nîşanê me dide ku “welat” ê ku di nava van romanên de ye romantîzekirî an jî îdealîzekirî nîne, encameke wisa derdikeve holê ku li dijberê modela “mal” a honakî ya teorîsyen û ronakbîrên sereke ye (Agnew 2005; Brah 1996; Safran 1991). Mirov dikare hêvî bike ku manendê vê portreyê di wêjeya filîstînî de jî bibîne, çimkî statûya filîstîniyan di mijara bêdewletbûnê de wekî

ya kurdan e; lêbelê, lêkolînên li ser wêjeya filistinî wêneyekî cuda berpêş dike ku zêdetir dişibe rewşên navborî yên li jorê. Al-Nakib wiha rave dike, romana bi navê *Parsekê li Ber Derê Şamê* ya nivîskara filistinî ya sirgûn Yasmine Zahran wiha salox dide “1/4ê Filistîna rastîn dorpêçkirî ye û bi dîwaran ve hatiye rapêçandin û bi darê zorê wekî kantonên bêjiyanbar hatiye dabeşkirin”; lêbelê, romana Zahran li pey şopa sînorê Filistîna “xeyalî” ye, ne li pey sînorê “rastîn” ê Filistinê ye. (Al-Nakib 2005: 238, 266). Welatê xeyalî yê ku di wêjeya sirgûniyê ya filistinîyan de, derfetê dide nivîskarê sirgûnî da ku bikaribe hesta pêbawerî û ewlehiyê ya telebkirî biafirîne, berevajî rewşa heqîqî û hevrik a Filistîna dagirkirî. Li ser mijara “welêt” cudatiya ku di navbera rabêja wêjeyî ya filistinî û kurdî de berdest e, ji paşxaneyên cuda yên nivîskarên sirgûniyê û dînamîkên cuda yên li welêt, derdikeve. Lewma, mecbûrî nîne ku sirgûnîbûn û bêdewletbûn heman şêwe û têgihîştinan encam bide.

Mirov dikare bibêje ku şayesandinên welatê kurdan û tespîtên ku etnograf û antropolog pêşkêş kirine, li hev nakin. Li gorî Alinia (2004) ya ku doktoraya xwe li ser koçberên kurd ên li Swêdê kiriye, wateyên “welêt” him di rastiyê de him jî di hesta xeyalî de gelek in û herdu jî dikarin bên îdealîzekirin û/an jî dikarin bi serboriyên trawmatîk re bên pêwendîdarkirin, ew trawmayên ku ji ber dijberî û zordariya dewleta desthilatdar rû daye. Eynî bi vî karî, lêkolînên ku ji aliyê Khayati ve di nav sirgûniyên li Fransa û Swêdê hatiye kirin, destnîşan dike ku welat bi koçberî, şer, zilm, bêistîqrariya polîtîk, rewşa bê-ewlekariyê, êşkence, asîmîlasyon û têkoşîna neteweyî û hesretê re têkildar e (Khayati 2008: 158). Alinia û Khayati amajê pê dikin ku berevajî vebêja honakî ya sirgûnî, serpêhatiyên trawmatîk ên ku ji aliyê muxatabê wan ve têne vegotin bi gelemperî xwe dispêrine faktorên derveyî yên mîna şer, zordariya dewletê û êşkenceyê. Lêbelê, di rabêja romana kurdî ya li Swêdê de, mirov dikare pêrgî rexneyên li ser kurdan bê. Hêjayî balkişandinê ye ku herdu nivîskarên navborî yên li jor jî ji cih û warên xwe hatine derxistin, bêdewletbûna yê berîn û sirgûnîbûna yê duyem şêweyên welêt yên têvel û tevlihev derdixine holê. Ev herdu faktor encama şayesandina neyînî ya welatê kurdan û nasnameya kurdî dide, ya berîn bi rewşa sirgûnîbûnê ve têkildar e, ya duyem jî bi rewşa taybet ya kurdan re vebestî ye. Her çiqasî jî heman paşxaneyê hatibin û xema wan a neteweyî hevpar bê jî, nivîsandina li hundir an jî li derveyî welêt bandorê li ser nêrîna “welêt” û nasnameyê dike. Dibe ku nivîskar di nav sînorên neteweyî de xwediyê heman hesta bêdewletbûnê bin, lê dûrahiya rastîn a fizîkî fêhma wan a

rewşa “vegera li malê” gur dike, û daxwaza wan a nostalgîk wekî nêzikahiyeke dijwar diguherîne. Angelika Bammer (1992: vii-xi) vebêjên rexneyî yên nivîskarên sirgûnî wekî “bêistîqrariya malê ya meqsedekê” pênase dike ku ew “wisa diyar e ku li hemû ast û cihan ‘mal’ [...] hildiweşe an jî ji nû ve tê pênasekirin.”

Li gorî pênasekirina Bammer, di mijara nivîskarên sirgûniyê yên kurd de, mesafe serwextiyekê derdixe holê ku bi riya vê “welat” û nasname hildiweşin û ji nû ve têne pênasekirin. Bi sûdwergirtina ji pozisyona lidervebûnê û hesta mehrûmîyetê qada sirgûniyê diguhere û dibe xaleke hindaviyê ku ji wir, ji hêlên polîtîk ve (nebûna yekîtiyê, xiyaneta li tevgera neteweyî) û ji qada sosyo-kulturî ve (bandora zordariya kurdên axa, şêx û kuştinên bi navê namusê) bi awayekî xwe-rexneyî li xwe mêze dikin.

Romannûs, teswîra grûpên mirovan ên kifş dikin ku xwedî taybetmendiyên hevpar in, weke mînak, ew kesana berê di polîtîkayê de çalak bûne, piştî cuntaya leşkerî ya 1980yî reviyane Ewropayê û bi gelemperî ji serboriyên trawmatîk bêzar bûne. Lewma, herdu nivîskarên sirgûnî yên di vê gotarê de ji aliyê fîzîkî ve ji dijberiyên berdest û rûdanên dawî yên li welêt dûr in, an nikarin têkiliyên xwe yên bi polîtîkaya navneteweyî ya li Ewropayê ve qut bikin an jî qut nakin. Ev herdem bergeheke neyînî û rexneyî di nav vebêja wan de diafirîne.

7. Encam

Dema ku hemû romanên li Ewropayê yên bi kurdiya kurmancî ve hatine nivîsîn li ber çavan bînin girtin, bi hêsanî mirov dikare bibîne ku gelek ji wan an li Kurdistanê derbas dibin an jî li ser babetên Kurdistanî ne. Nivîskar bi gelemperî an mijara xwe dixin nav pêwendekê dîrokî an jî vê mijarê dispêrine dorhêla polîtîk û sosyo-kulturî ya li Kurdistanê, lê nasnameya wan a etnîk, welatê wan ê xwemalî û dîrokî ji endîşeya wan a nasname û dîroka welatê mazûvan û serboriya nivîskêr a di vê pêwendê de, giringtir e. Bi vê ve girêdayî, nasnameya sosyo-polîtîk a bi “welêt” ve girêdayî wisa dixuye ku ji serboriyên wan ên li welatê mazûvan giringtir e. Sedema sereke ne ew e ku “welat”ê ku ji dewletê bêpar e, zêdetir şayanê xemxweriyê ye, lêbelê, wekî ku me berê jî destnîşan kiribû (û ya ku pênasekirina sirgûniyê jî pêşniyar dike) ji ber ku bêcihûwarbûnên wiha hêviya vegera li “welêt” hişyar dike û ev jî dibe sebeb ku nivîskar ji serboriyên sirgûnî yên li welatê mazûvan zêdetir li mijar û nêrînên di derbarê welêt de hûr bibe.

Şayanê gotinê ye ku mirov bêje yên ku li ser serboriyên xwe yên li sirgûniyê hûr dibin, li ser kêmasiya materyalên derbareyê dorhêla navxweyî û derveyî, dorhêla derveyî ya çandêke cuda, ne-baldariya ewropiyaniyan ya li ser babetên kurdî, serêşî û gazinên koçberan ên ligel hevdu, nîqaş dikin. Têkçûna adaptasyonê, çandên cihêreng, rewşa welêt a nediyar wêrekiyê dide nivîskaran da ku ji welatê ku lê dihêwirin zêdetir, bala xwe bidin welatê xwe yê xwemalî yê ku wan terka wê kiriye.

Karakterên kurd ên van romanên a di qada bêbiryarîyê de ne ku dikeve navbera bêrîkirin û ne-bêrîkirinê. Ji rûyê hesta bêçihûwarbûnê ya gur ya ku ne aîdê “welêt” ne jî “xeribî”yê ye, rewşa sirgûniyê dibe rewşeke hebûnê (*existential*). Welatê kurdan ê perçebûyî wekî cihekî ne-ewle û bêistîqrar hatiye saloxdan, lê cihê ku lê hêwirîne jî wekî cihekî aram û ewle nayê nitirandin.

Ev gotara di heman demê de angaştên giştî yên derbareyê wêjeya sirgûnî ya ku tê de têgihiştina nivîskêr a li ser welatê îdealîzekerî û aşopî heye, red dike, bi nîqaşkirina vê yekê ve jî nivîskarê sirgûniyê yê kurd fikreke Kurdistana rastîn a ku di navbeyna rastiyên dîrokî û nirxandinên hundirîn de maye, pêşniyar dike, ev jî bi ji wêneyekî “efsaneyî” û “îdealîzekerî” yê ku bi gelemperî wêjeya sirgûnî pê tê pênasekirin zêdetir wêneyekî neyînî diafirîne. Bandora sirgûniyê, serboriyên trawmatîk ên di welatê kurdan de û rojeva siyasî ya têvel û dijber digihîjin hevdu û di van portreyên welêt ên rexneyî de encam dide. Temsîliyeta “welêt” a di romanên diyasporîk de, ji bo rexneyên siyasî û dîtinên îdeolojîk yên nivîskaran giring e, ev jî Kurdistanê wekî “mal” eke îdeal dide peyîtandin ku tê de aramî, piştgirî û azadiya sosyo-polîtîk berdest e.

Dawiya dawî, bersiva pirsê Clifford ev e, “Gelo avakirina maleke ji malê dûr gengaz e?” (1999: 302), min destnîşan kir ku ji bo lehengên wêjeyî yên kurd, wisa dixuye ku ne gengaz e welatê mazûvan wekî welatê xwe bibînin. Lewma, di heman demê de ji bo karakteran welat “her çiqas ziyareta xaka cografîk gengaz be jî cihekî ne-vegerê ye” (Brah 1996: 192). Herwiha, karakter xwe nikarin ji valahiya di navbera retorîka îdeolojîk a bêrîkirina Kurdistanê û têkoşîna rojane ya li ser hebûna komî û şexsî ya li diyasporayê xelas bikin.

Çavkanî

Agnew, V (ed.) 2005, *Diaspora, memory, and identity: a search for home*, University of Toronto Press, Toronto.

Ahmadzadeh, H 2011, 'Magic realism in the novels of a Kurdish Writer, Bakhtiyar Ali', *Middle Eastern Literatures*, vol. 14, no. 3, pp. 287-299.

Aknur, M 2012, *Democratic consolidation in Turkey*, Universal-Publishers, Boca Raton, FL.

Alinia, M 2004, 'Spaces of diasporas, Kurdish identities, experiences of otherness and politics of belonging', teza doktorayê ya neçapbûyî, Department of Sociology, Gothenburg University, Sweden.

Al-Maleh, L (ed.) 2009, *Arab voices in diaspora: critical perspectives in anglophone Arab literature*, Rodopi, Amsterdam and New York.

Al-Nakib, M 2005, 'Only Palestine is real: virtual counterpoints in Yasmine Zahran's A Beggar at Damascus Gate', *Diaspora: A Journal of Transnational Studies*, vol. 14, no. 2/3, pp. 237-273.

Anderson, B 1983, *Imagined communities: reflections on the origin and spread of nationalism*, Verso, London.

Aydoğan, M 1997, *Pêlên Bêrîkirinê*, Nûdem, Stockholm.

Bammer, A 1992, 'The questions of Home', *New Formations: A Journal of Culture/Theory/Politics*, no. 17, Summer, pp. vii-xi.

Berns-McGown, R 2007-2008, 'Redefining' Diaspora': The Challenge of Connection and Inclusion', *International Journal*, vol. 63, no. 1, pp. 3-20.

Blunt, A 2003, 'Geographies of diaspora and mixed descent: Anglo-Indians in India and Britain', *International Journal of Population Geography*, vol. 9, no. 1, pp. 281-294.

Bordessa, R 1988, 'The city in Canadian literature realist and symbolic interpretation', *The Canadian Geographer*, vol. 32, no. 3, pp. 272-274.

Bozan, M 2007, *Asim*, Pêrî, Istanbul.

Brah, A 1996, *Cartographies of diaspora: contesting identities*, Routledge, London and New York.

Cewerî, F 2005, *Payiza Dereng*, Nûdem, Stockholm.

Chow, R 1993, *Writing diaspora: tactics of intervention in contemporary cultural studies*, Indiana UP, Indianapolis.

Clifford, J 1999, 'Diasporas', in *Migration, diasporas and transnationalism*, eds. S Vertovec & R Cohen, Elgar, Cheltenham.

Claval, P 1998, *An introduction to regional geography*, Blackwell, Oxford.

Crang, M 1998, *Cultural geography*, Routledge, London.

Davis, L 1987, *Resisting novels: ideology and fiction*, Methuen, London.

Eliassi, B 2010, *A stranger in my homeland: the politics of belonging*

among young people with Kurdish backgrounds in Sweden, Doctoral Dissertation: Mid Sweden University.

Eliassi, B 2012, 'Political terrains of writing belonging, memory and homeland', in *Emergent Writing Methodologies in Feminist Studies*, ed. M Livholts, Routledge, New York, pp. 83-97.

Gilbert, E & Simpson-Housley, P 1997, 'Place and spaces of dislocation: lady Oracle's Toronto', *The Canadian Geographer*, vol. 41, no. 3, pp. 235-248.

Golan, A 2002, 'Israeli historical geography and the holocaust: reconsidering the research agenda', *Journal of Historical Geography*, vol. 28, no. 4, pp. 554-565.

Gopinath, G 2005, *Impossible desires: queer diasporas and South Asian public cultures*, Duke University Press, Durham.

Hebditch, D & Connor, K 2005, *How to stage a military coup: from planing to exetion*, Greenhill Books, London.

Jameson, F 1988, *The ideologies of theory: essays 1971-1986*, vol. 2, Routledge, London.

Khayati, K 2008, 'From victim diaspora to transborder citizenship? Diaspora formation and transnational relations among Kurds in France and Sweden', teza doktorayê ya neçapbûyî, Linköping Studies in Arts and Science 435, Linköping University, Sweden.

Khayati, K 2011, 'Kurdish diaspora in Europe: from victim diaspora to the practice of long distance nationalism and transborder citizenship'. Paper presented at World Kurdish Congress, The Hague, Netherlands.

Kreyenbroek, PG & Allison.C (eds.) 1996, *Kurdish culture and identity*, Zed Books, London.

Leezenberg, M 2011, 'Soviet Kurdology and Kurdish Orientalism', in *The heritage of Soviet Oriental studies*, eds. M Kember & S Conerman, Routledge, Abingdon, pp. 86-102.

Levy, A & Weingrod, A (eds.) 2005, *Homelands and diasporas: holy lands and other places*, Stanford University Press, Stanford, CA.

Lipovsky, IP 1992, *The socialist movemet in Turkey 1960-1980*, E. J. Brill, Leiden.

Lukács, G 1971, *The theory of novel* (trans. A Bostock), MIT Press, Cambridge, MA.

Mardorossian, C 2002, 'From literature of exile to migrant literature', *Modern Studies*, vol. 32, no. 2, pp. 15-33.

Marienstrass, R 1989, 'On the notion of diaspora', in *Minority peoples in the age of nation-states*, ed. G Chailand, Pluto, London, pp. 119-125.

McDowall, D 2004, *A modern history of the Kurds*, I. B. Tauris, London.

McKeon, M (ed.) 2000, *Theory of the novel: a historical approach*, John Hopkins University Press, Baltimore, MD.

Meinig, D 1983, 'Geographies as an art', *Transactions of the Institute of British Geographers*, no. 8, pp.3314-328.

Mishra, V 2007, *The literature of the Indian diaspora: theorizing the diasporic imaginary*, Routledge, London and New York.

Naficy, H 1993, *The making of exile culture: Iranian television in Los Angeles*, University of Minnesota Press, Minneapolis.

Natali, D 2005, *The Kurds and state: evolving national identity in Iraq, Turkey, and Iran*, Syracuse University Press, NJ.

Payaslian, S 2010. 'Imagining armenia' in *The call of the homeland, diaspora nationalisms, past and present*, eds. Gal, AS Leaussi & AD Smith, Brill, Leiden and Boston, MA.

Pocock, D (ed.) 1981, *Humanistic geography and literature: essays on the experience of place*, Croom Helm, London.

Porteous, JD 1985, 'Literature and humanist geography', *Area* (Royal Geographical Society), vol.17, no. 2, June, pp.117-122.

Qaso, L 2003, *Ronakbîr*, Pelda, Stockholm.

Romano, D 2006, *The Kurdish nationalist movement: opportunity, mobilization, and identity*, Cambridge University Press, Cambridge and New York.

Rudolph, JR 2003, *Encyclopedia of modern ethnic conflicts*, Greenwood Press, Westport, CN.

Ryang, S & Lie, J 2009, *Diaspora without homeland: being Korean in Japan*, University of California Press, Berkeley and Los Angeles.

Safran, W 1991, 'Diasporas in modern societies: myths of homeland and return', *Diaspora*, vol. 1, no. 1, pp. 83-99.

Schmidinger, T 2010, 'The Kurdish diaspora in Austria its imagined Kurdistan'. Paper presented at WOCMES, Barcelona, Spain.

Shurmer-Smith, P 2002, *Doing cultural geography*, Sage Publications, London.

Torres, Los Angeles M 1999, *In the land of mirrors: Cuban exile politics in the United States*, University of Michigan Press, Michigan.

Toticagüena, BP 2004, *Identity, culture, and politics in the Basque diaspora*, University of Nevada Press, Reno and Las Vegas, NV.

Van Bruinessen, M 1999, 'The Kurds in movement: migration, mobilisation, communication and globalisation Kurdish question', Working Paper, no. 14, *Islamic Area Studies Project*, Tokyo, Japan.

Vali, A 1998, 'The Kurds and their "Others" : fragmented identity and fragmented politics', *Comparative Studies of South Asia, Africa and the Middle East*, vol. 18, no. 2, pp. 82-95.

Vali, A 2003, 'Genealogies of the Kurds: constructions of nation and national identity in Kurdish historical writing', *Essays on the origins of Kurdish nationalism*, ed. A Vali, Mazda Publishers, Costa Mesa, CA, pp. 58-105.

Veronis, L 2007, 'Strategic spatial essentialism: Latin Americans' real and imagined geographies of belonging of Toronto', *Cultural Geography*, vol. 8, no. 3, pp. 455-473.

Walhbeck, Ö 1999, *Kurdish diasporas: a comparative study of Kurdish refugee communities*, Macmillan, London.

Watt, I 2001[1957], *The rise of novel: studies in Defoe, Richardson and Fielding*, University of California Press, Berkeley and Los Angeles.

Zhang, B 2008, *Asian diaspora poetry in Nort America*, Routledge, New York.

Çavkanî: Nordic Journal of Miration Research. Volume 4, Issue 2, Pages 82-90, May 2014